DENGÊ KURD

P.D.K.S
الپارتي
الحزب الديمقراطي الكردي في سوريا

11 Gulan 2713 k 1-05-2013 z DENGÊ KURD -Hijmar (7) www. Pdksp.org

# Fidralîzim wekû Rêçareyeke Rêkûpêk



## Rojnamegerî

Hersal di22 nîsanê de cejna Rojnamegeriya Kurdî Tê pîrozkirin bi coş û xiroş jibal sazî û dam û dezgehên Rojnamegerîyê û Rojnamevanan ve li seranserî Kurdistanê lê Rojnamegerî çîye û çima heye û çi armancan pêktînê ? -Rojnamegerî şoreşa agah û zanyarî û pêzanîna ne ,di hemû Bîyaf û waran de, guhestin û veguhestina nerîn û tênerînane li ser hemû astên çin û qatên zanistî û sîyasî û rewşenbîrîyê dako mirovê serdemxwaz hîn û fêrî hemû raz û nihênîyan bibe bê tu cudahî û jêvegirtin , dêmekî hebûna Rojnamegerîyê bingeheke şaristaniye di Rojgarê nû de li tenişt hersê desthilatên fermî de (yasagerî-dadperwerî- bicihgerî) da ko kiryara jiyana Rasteqîne misoger bibe di cîhana kar û xebata mirovê xuedî kêşedoz û Pirisgirêkên tewergêr û wisa hino hino Pêvajoya bûyer û qewmanan ko serî bikşîne biberû sersedê ve da ko armancên kesokî û welatparêzî rêkûPêkbin bi viyaneke serbest û serdest.

2 « Ziman û Tîp û Yekîtî

3 « REWŞENBÎR Û QONAXÊN NAKOKIYAN

3 « Fîdralîzim Ji Kurdên Rojava Re Mafekî rewa ye

4 « Hevgirtina sîyasî roja rojnamegeriya Kurdî vejand

# Fidralîzim wekû Rêçareyeke Rêkûpêk

loloxan

Xwestek û daxwazên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê hatine diyarkirin li pêşû li paş şoreşê jibo avakirina Rijêmeka nûjen li sûryaya dahatî û hêvîxwaz di bicihanînûçespandina dîmokatiyê û pirhijmarîyê û sîstemê perlemanî di danûstana desthilata siyasî de, da ko li dûmahîk û encamê tevgera rizgarîxwaz dikari be fidralîzmê bidest xweve bîne, ev Rêçare ya siyasî Rêbazeke biragmatiye di cîhana ramyariyê de, da ko Kurd pêngavin mukum û tebût bi havêjin di alvêriya bazara siyasî de.

Duruşmê fidralîzmê xwestekeke cemaweriye di ser ko çend pêşniyarên dîtir hene wekû kargêrana xomalî û nehebûna navendgîriyê (xomanî) lê ligorepana siyasî fidralîzim dimîne daxwaz û armanca serekî ji gel û tevgerêre , lê çend kospû asteng di rêbaza pêkanînê de serkêş û berkaşin ew jî evin.

1-Ne li hevkirina alîgirên tevgera rizgarîxwaz liser evê daxwaz û armancê bişêwazekî sitratîjî û karname lê derketin û li paş re ne hebûna sewdanekî têgehiştî di ravekirina evê pirsgirêkêde, dako têkeve Rojeva kêşedoza Kurd li Rojava.

2-Nakokîyên bingehîn û serekî di navbera herdû encûmenan de û têkelîyên cuda cuda ji alîgeran re li hundur û derdorê re na hêlin ko tênerîn û lê hatineke siyasî xwe rakşîne gorepana livlivîna şoreşgêrî da ko ancamê xwe serrast û tekûz bike di sewdan û karpêhatin û kartêkirinê de wisa bi evê tevlihevîyê mafê Kurd dimîne sar û lawaz di warê pêkanin û çespandinê de.

3-Nekarbûna tevgera rizgarîxwaz di raserîna bandorê de liser dijberîya erebîya sûryayê da ko lihevhatineke welatparêzî lidarkeve dako asoyê pêşerojê geş bibe û keskesora xwe vede li asmanê şoreşa ko bûye cenga wêranê.

-miletê Kurd bihemû çîn û qatên xwe biryara xwenî netewî daye û helwêstê xwe serbest kirîye bi pêşnîyarkirina duruşmê fidralîzmê ewê ko bûye mafekî rewadar jêre têtê xebatkirin û xebitîn di hemû çalakî û livlivînan de, da ko trêna kêşedoza Kurd têkeve ser rêçxanka rast û ron û xwe rizgarke ji karname u rojeva navxoyî û navherêmî û bazara sîyasîya navnetewî.

## Duruşmê Fîdralizmê Xwestekeke Cemaweriye û armanceke netewiye




# Ziman û Tîp û Yekîtî

Mihemed Emîn Erefat
hemresh5@hotmail.com

Mamostayê mezin û gewre celadet bedirxan di bêje:( yekêtiya miletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tête pê , û di yekîtiya zimênde gava pêşîn yekîtiya tîpane). Bi rastî ev gotina mezin, ji devê mamostakî mezin,di dilê mirovde cihekî pir mezin digre , bê gumane ku ziman pileya herî giringe di pêpelûka avakirina nejadan de , û nejad bêyî ziman nabe nejad , bi tayîbet miletek wek miletê kurd ku gelek îşkence ,û zor dîtiye , û di hemû serdemên dîrokê de hatiye dagîrkirin ,û di gelek newalên zordariyê de bûriye,û bi sedê salan ji aliyê gelek dagîrkeran ve ,wek tirik , faris,ereb,ingilîz ,firansî, û heta rûsan. Zanyarê civakî yê mezin isma,il pêşekçî yê ku bi nejada xwe ve tirke di bêje:( di nav bera ziman û ramanê de têkiliyeke xurt heye, eger hûn bi kurdî bi axivin hûnê wekî kurdan bi ramin , eger hûn bi tirkî bi axivin hûnê wekî tirkan bi ramin). Ji gotina zanyarê mezin isma,il pêşekçî di ête ber çav ku çawe bandora ziman ji hemû aliyan ve li jiyana mirov dibe Çimkî Her miletek ji van miletan yên ku Kurdistan dagîr kirine , bandora xwe li kurdan kirin, çi ji aliyê civakî, yan aborî yan çandî , lê bandora herî giran û mezin zimane , ewjî encama ji hev dûrkirinê bû ya ku dijmin bi serê me anî,û bû sedemeke sereke bo avakirina zaraweyên kurdî, wek kurdmancî ,soranî,lorî,zazî, û yên biçûk ku bi sedan çêbûn, û dibe di paşerojêde bibin aloziyeke mezin kû neyên careserkirin . Raste zarawe di be stûnek bo zengînkirina zimên , lê piraniya wan dibe girêbendek mezin , lê aloziya herî mezin ewe ku em bi du şêweyan zimanê xwe bi nivîsin ,bi têpên erebî ,û tîpên latînî ,ev girêbendek herî girane li paşeroja çand, tore, û wêjeya kurdî , çimkî sedema serekeye di paşerojê de bo yekîtiya miletê kurd ,kurdên me yên rojhilat û yên başûr bi tîpên erebî dinivîsin , û kurdên me yên bakur û yên rojava bi tîpên latînî di nivîsin , bi rastî ev herdû şêwenivîs di be ji hev veqetandinek berî ku em bibin yek , bi şêweyekî din berî ku em yekîtiya xwe ya xaknîgarî li ser qadê bi kar bînin ,em bi hiş, ramanan, û çandê ji hev di Kevin ,lewra çare seriyek ji vê pirsgirêkê re dive , û na be em girêbendên îro bikin barek li ser milê nifşê nû , bê gumane ku em bixwazin çareseriyekê bi bînin ji vê pirsgirêkê re - gava yekem avakirina komîtek zimanî, têde zane zimanên kurd ji her çar parçên kurdistanê lev bicivin , û karekî bi hêz were kirin , û ber bi yekîtiya tîpan herin ,da bibe gava yekem di avakirina yek gewd û yek giyan ji zimanê dê re , û zimanê kurdî gelek zengîne bi gotina , û di kare gelek gotinên nûjen bi afirîne , di vî warî de helbestvanê mezin S, cegerxwîn dibêje: (dewlemendiya ziman bi du tiştên mezine : yek pişavtina gotinên bêgane, ko dinav zimanekî hebin ,du hebûna dezgeh û pêşveçûna aborî ye , ko navne nû têne çêki rin û afrandin) , û gava diwm danîna ferhengek sereke ji hemû kurdan re ,ev ferheng bi herçar zaraweyan bête danîn , û bibe lê vegerek ji hemû nivîskar,û zanezimanên kurd re. Bê gumane ku rêka mamostayê gewre celadet bedixan rêkeke pîroze , û gava yekeme bo avakirina yek ziman ,û yek ferheng , û yek rêzmana kurdî bo me danî, mamoste celadet lehengê rêzimana kurdî ya latîniye , lê gelek leheng ji mere divin , da em karibin bi yek gewd ,û yek giyanî bijîn û bi axivin. Lehengên şoreşa çandê ji mere divin ,da bibin mûm û vind di ezmanê ziman û rêzimana kurdî de ,û rêka mamoste celadet berdewam bikin , û bi erkê xwe yê niştîmanî rabin , li dawî dive em herdem zanibin ku yekîtiya tîpan , çand , tore , wêje , hiş , raman, berî yekîtya ser qadê têtê pê .



www.arsivakurdi.org



# REWŞENBÎR Û QONAXÊN NAKOKIYAN

BEXT REŞÊ KOÇER

Dema merov xwe bibînin berpirsyar diber miletekî de an civakekî de , bi taybet merovê xwe dibîne rewşenbîr û hişmend û çalakvan di nav milet û civakê de , parastin û pêşxistina wan ji merov tê xwestin û dibe erkek netewî , nexasim dema ew milet û ew civak di aloziyan re derbasdibin , divê ew merov bi wêrekî û bê tirs li ser pirsgirêk û nakokiyên wan rawestin û divê merov ji siya tirs û newêrekiyê xwe rizgar bike . Minak wek milet û civaka me ya Kurdî di rojavayê Kurdistanê de , nexasim di vê qonaxa reş de , ya ku miletê me û civaka me neha tê re derbas dibin ji encama bandoriya vê şoreşa ku ev du sale milet û civaka me tê re derbas dibin û hîn berdewame û hîn rewşa çarenûsa wê ne zelale û ev parçebûn û xirabûna civakê ya bi xwe re anî û ev tirsa li rex me peydakirî ku rojek ji rojan ev milet û ev civak wê bero tevlîheviyekî herin , ji sedema wan pirsgirêk û nakokiyên yên ku roj bi roj gurtir û geştir dibin , tenê merovên rewşenbîr û nivîskarên wêrek û bê alî dibin arîkar û peydakerên dermanê êş û nexwşiyên vî miletî û vê civakê di riya pênûsên xwe re yên ku bi rastî baweriya wan tê bi rola kesên rewşenbîr û hişmend û zana di avakirin û serrastkirina milet û civakan de , bi taybet di qonaxên reş de yê ku milet û civak tê re derbas dibin ,û neha dûrxistina milet û civaka me ji van hemî metirsiyan û parastina aramî û tenahiya wan dibe erkê hemî pênûsan ku xwe berpirsyar diber milet û civaka xwe de bibînin û divê hewldanên evsane bikin ku milet û civaka xwe dûr bikin ji wê bandoriya neyênî ya ku vê şoresê li wan kirî û rizgarkirina wan ji wan encamên reş yên ku neha li ser xakê têne xuyakirin , di riya şiyarkirin û geşkirina yêkitiyê û biratiyê û kurdayetiyê di nav milet û civaka Kurdî de .

# Fîdralîzim Ji Kurdên Rojava Re Mafekî rewa ye

Mistefa Minle

BerÎ her tiştî gava em bixwazin li ser maf û mafmendiyên gelê Kurd di rojavayê Kurdistanê de rawestin, pêdiviye merov hindekî vegere belge û bawernameyên navnetewî. Li gor nêrînên rêdane yên yekîtiya netewan, ka heya kû derê em Karin bi miletekî re bêjin ku netew e yan na, û mafê wî yê rewa di fîdralîzimê de çi ye. Ji ber vê yekê gelê me yê Kurd di rojava de, îroj hejmartina wan nêzîkî çar milyonan e, xwedî zar û ziman û xaknîgariyekê ye, û li ser xaka xwe ji hezar salan de dijî. Vêca îroj ji hemû hêz û tevgerên Kurdî yên welatperwer tê xwastin li xwe mêze kin wek miletekî xwedî maf û netew, ne kêmtirî miletên dî di rojhilata navîn de ne, divê em lê xwedî bin û li doz û armanca vî gelî pêk bînin, vêca li ber bandora şoreşa Sûrî ev keys û derfet neketiye gelî Kurd di rojava de ji sed salan de. Lewre erk û stubariya me tev ne û pêwîste em ji dest xwe vê derfetê di vê şoreşê de bernedin, di warê wergirtina mafê gelê Kurd de, ji bona vê yekê Barzaniyê nemir di sala 1970 de wek partiya demoqrat a Kurdistana (Îraq) di guftûgoyên xwe de bi rêjîma Sedam re, ti carî xwe danexist asteyên nizm û di derheqa çareserkirina mafê gelê Kurd de û bi kêmaniyê erê nekirin, her weha digot Kerkûk dilê Kurdistanê ye. Di vê warî de divê em Kurd û Partî di vê qonaxa hestiyar de, hajî pêlanên şovînizma Erebî bikin, ku me Kurda bi hin daxwaz û wergirtinên aloz nexapînin û bi hin mafên hevwelatiyê me pê razî nekin, lewre di pêşerojê de di Sûriya nû de ji Kurdistana rojava re mafekî me rewa heye di fîdralîzmê de.



## Iro roj kurd û Partî di Qonaxeke hestyar de ne

# Hevgirtina sîyasî roja rojnamegeriya Kurdî vejand

115 sal derbas bûn liser zayîna rojnamegerîya Kurdî biderketina rojnameya Kurdistan , li dêrikê bihelkeftina salveqera roja rojnamegerîyê, yekîtiya siyasî ahengsaziyek lidarxist bi amadebûna cemawerekî berfireh û bi coş û xiroş û wisa çend gotar ji layengirên part û rêxistinên siyasî û hevrêzên sûdmend û watadar hatin xwendin di nirixdana karîgeriya evî bûyerê dîrokî dejibal berêzan (seîd hemê- M.emîn se'dûn- nûşîn fendî) û çend helbestvanan jî beşdarîkirin wek (îhan-leyla- bêwarhisên- narîn) û dinava ahengsazîyê de çend sitranên fiklikorî hatin dengvedan jibal koma sitêrên azadî.




## Êvarsazîyeke helbestî li Girkêlegê

Dengê kurd

Çar helbestvanên Kurd êvarsazîyeke helbestî lidarxistin lihola berhik ya partî li dêrik bi amedebûna cemawerekî guhvedêr û têvenêr di warê helbestê de. Ewan helbestvanan yek li dû yekî das didan hevdû jibo pêşkêşkirina berhemên xwenî nûjen û watadar bi herdû zimanên Kurdî û erebî ewjî evin (aram ehmed- leyla çeto- qasim omer- perwîn hisên).





## Komela sobarto serperiştiya hefteyeke rewşenbîrî jinane kir

Rêkeftî 20/4/2013 hefteyeka rewşenbîrî jinane destpêkir bisaygeriya komela sobarto li Qamişlo bibeşdarbûna komerîşkekê ji rêxistin û komelên ko guh û giringîyê didin karûbarên jina Kurd wek (Aferînronî- yekîtiya jina kurd- şawşka – hêvî jina kurd ya azad).

## Serkirde



Serkirdeyên jîr û çeleng
Hunin peyva rast û durist
Serkeftina gela hunin
hin kardikin bo navêxwe
zeviya waye beyar
derdême yekbûna gele
ferset ji zêre hatîye
pabendebin gel şoreşê
hin bo dujmin bûn berderîk
difiroşin war û milet
serkirdeyên kurdê çeleng

hêvî û omîda miletin
yan jê kû hin rêz û xetin
gava yekem bo pêşketin
cotyarîyê bê haletin
zîwan û xerdel bi serketin
hin bo yekbûna illetin
gel yekbûnêyê serketin
hun nedlivin nedlebitin
hejb axaftin û pit pitin
yeqîne kû bê rumetin
babet eve hun babetin

ADIL DÎLANÎ

## Komela şawişka pişkûrîna pêşangeha pertûkê dike

Dengê kurd

Bi helkefta cejna rojnamegeriya kurdî pişkûrîna pêşangeha pertûkê lidar ket 19/4/2013 jibal komela şawişka bibeşdarbûna evan pertûkxaneyan (bedirxan- Çarçira – şawişka) armanc ji vê pêşangehê ewbû têvegerandin çespandina têkeliyê dinavbera mirov û pertûkê de bigiştî û hêrsdana jinê da ko berê xwe dibe xwendinê bitaybetî û pêre belavbûna rewşenbîriya lidar xistina wekû evî corî ji pêşangehan li Qamişlo.



www.Lekurdi.org